# UDI dîsa dest bi çareserkirina serlêdanên penaberiyê ên ji Sûriyeyê dike

**UDI dê niha dîsa dest bi çareserkirina serlêdanên penaberiyê ji Sûriyê bike. Ev ji bo serlêdanên mezinan, malbatên xwedî zarok û ji bo zarokên ku bi serê xwe hatine derbasdar e.**

## Em ê di meha kanûna duwem de dest bi hevpeyvînan bi serlêderên pêşîn re bikin

Em ê di meha kanûna duwem de dest bi hevpeyvînan bi penaxwazên ji Sûriyê re bikin. Lê gelek kesên ji Sûriyê hene ku li benda bersivê ne. Her weha gelek kes ji welatên din jî hene ku qasî sûriyan li bendê ne. Ev tê vê wateyê ku her çende em ê dest bi xebata li ser serlêdanan bikin jî, ew dê demek dirêj bixwaze berî ku em pêra bigihin dozên we hemiyan yên ku li bendê ne çareser bikin.

## Dibe ku nirxandina hin dozan wextekî dirêjtir bistîne

Li Sûriyê rewş gelekî guheriye. Divê UDI dozan li gorî rewşa nû binirxîne, ku ew jî tê wê wateyê ku dema ku em dozan çareser dikin, divê em agahdariyên nû bidestbixin. Ji ber vê yekê, divê em li ser her dozê demeke dirêjtir bikarbînin, nemaze di meha kanûna duwem de dema ku emê destpêbikin. Wê hingê dibe ku piştî kirina hevpeyvînê demeke dirêjtir here berî wergirtina bersivê li gorî dema berê. Her wisa heye ku hun bibînin ku hin kesên ku piştî we daxwaza penaberiyê kirine, berî we bersivê bistînin. Hin doz dê ji yên din demeke dirêjtir bidomin.

## Agahdariyên bêhtir ber bi dawiya meha kanûna duwem ve

Em ê di dawiya kanûna duwem de agahdariyên bêhtir bidin we li ser xebata  ku tê kirin li ser van dozên penaberiyê.

Em dizanin ku hûn ji zû ve li bendê ne û ev ji bo we pir zehmet e. Lê mixabin, piraniya we neçar in ku xwe jê re amade bikin ku lazime hun demeke din bisekinin.

## Ma tu dixwazî vegerî Sûriyê?

Eger tu dixwazî vegerî Sûriyê, UDI dikare alîkariya te bike û rêwîtiya te rêkbixe, û tu dikarî alîkariya dravî (pere) bistînî ji boyî ji nû ve li Sûriyê dest bi jiyanê bikî. Ev jê re «vegera welat a bi piştîvanî» (assistert retur) tê gotin. Ger li welatekî din ji xeynî Sûryê mafê te yê rûniştinê ku bi kêmî şeş mehan derbasdar e hebê, tu dikarî daxwaza vegera bi piştîvanî ji boyî vegera wî welatî bikî.

## Mirov çawa serlêdana wergirtina alîkariyê dike bo vegera welat

Pêdivî ye ku tu ji bo vegera bi piştevanî li ser malpera udi.no serlêdanê bikî. Yên ku li kempa penaberan dixebitin dikarin alîkariya te bikin. Eger tu serlêdana alîkariyê ji boyî vegera bi piştevanî bikî, divê tu serlêdana xwe a penaberiyê bi paş ve **venekşînî**.

## UDI dê vegera te rêk bixe û dê alîkariya diravî (pereyan) bide te dema tu vegerî

Eger serêdana te a vegera welat hate qebûlkirin, em ê bilêtan ji bo te bikirin û tu dê di roja çûyîne de an gava ku tu gihîştî Sûriyê, piştgiriya diravî li balafirgeha Osloyê bistînî.

## Divê te belgeyeke (wesîqeyeke) rêwîtiyê a dersbadar hebe

Ji boyî ku tu bikaribî bi rêya programa vegera welat a bi piştevanî vegerî, divê di destê te de belgeyeke rêwîtiyê a derbasdar hebe.

- Eger tu ne ewle bî ka gelo belgeya rêwîtiyê a te derbasdar e yan na, tu dikarî ji me re telefonê vekî û emê alîkariya te bikin.
- Eger belgeya rêwîtiyê a te li cem polîsan be, em ê wê bidestbixin û teslîmî te bikin gava ku tu dê bi rêkevî.
- Eger di destê te de belgeyeke rêwîtiyê a derbasdar nebe, tu dîsa dikarî ji bo vegera welat a bi piştevanî serlêdanê bikî û em ê hewl bidin ku ji te re bibin alîkar. Wê hingê pêdivî ye ku tu wekaletnameyekê ji me re bişînî ku heq didê me em formekê îmze bikin ku rê dide me ku em kopiyekê ji belgeyên te bişînin balyozxaneya Sûrî. Balyozxaneya Sûrî jî dixwaze ku bi te re biaxive da ku piştrast be ku vegera te bi dilxwazî ye, ji ber vê yekê em hewce ne ku tu hejmara têlefona xwe bidî me.

## Tê çiqasî alîkariya diravî bistînî?

Tê çiqas pereyan bistînî girêdayî ye bi ka serîlêdana te a penabeiyê gihiştiyê kîjan qonaxê:

- Heke tu serlêdana alîkariya bi piştevanî bikî *berî* ku em serlêdana te a penaberiyê çareser bikin, tê 15,000 kronan bistînî.
- Heke te bersiva refzê wergirtibe û ji te re muhleta derketinê ji welêt hatibe diyarkirin, lê daxwaza vegera bi piştevanî bikî <u>berî</u> ku muhlet biqede, tê 15,000 kronan bistînî.
- Heke te bersiva refzê wergirtibe û ji te re muhleta derketinê hatibe diyarkirin, lê daxwaza vegera bi piştevanî bikî <u>piştî</u> ku muhlet biqede, tê 5,000 kronan bistînî.

Her kesê ku rêwîtiyê dike vî pereyî distîne. Ev tê vê wateyê ku eger hûn malbateke xwedî zarok bin, her yek ji zarokên we jî dê van pereyan bistîne.

Ger zarokên we yên di bin 18 salî de hene ku dê bi we re vegerin welatê xwe, hûn ê ji bo her zarokekê 10,000 kronan weku alîkariya zarokan bistînin.

## Penaberên biçûk (qasir) ên bi serê xwe pereyên bêhtir weku alîkarî werdigirin

Mîqdarên ku tu weku kesekî qasir (temen biçûk) distînî zêdetir e ji miqdarên ku kesên din werdigirin. Her weha, eger hebin, em piştgiriyê didin wan kesan ku pêşwaziya te dikin li welêt.

- Ger tu ji bo vegera bi piştevanî serlêdanê bikî *berî* ku em serlêdana te ya penaberiyê çareser bikin, dê 37,000 NOK ji te re were dayîn.
- Eger te refz wergirtibe û ji te re muhleta derketinê hatibe diyarkirin, û *berî* ku muhlet derbas bibe daxwaza vegera welat a bi piştevanî bikî, tê 37,000 NOK bistînî.
- Eger te refz wergirtibe û ji te re muhleta derketinê ji welêt hatibe diyarkirin, lê wext ser muhletê re derbas bibe û ti hîn li vir bî, û paşê piştî derbasbûna muhletê daxwaza alîkariya vegera welat bikî, tê 27,000 NOK bistînî.
- Eger li Sûriye an jî li welatekî din ku tu dikarî biçî wir kesin hebin li te binêrin, dê 10,000 NOK ji wan re were dayîn piştî vegera te. Ev derbasdar e tu çi berî an piştî muhleta derketinê a diyarkirî rêwîtiyê bikî.

### Pirsên te hene liser vegera welat a bi piştevanî?

Eger di derheqê vegera welat a bi piştevanî de pirsên te hebin, tu dikarî bi xizmeta şîretkirinê a UDI re bi têlefonê liser hejmara 23 35 16 00 biaxivî. Piştre liser 7 bitikîne da ku tu bi UDI re biaxivî liser vegera welat a bi piştevanî.